

Initiativa diji Çipkartan

c/o Berliner Büro für Gleiche Rechte
Haus der Demokratie und Menschenrechte
Greifswaldstraße 4 / 10405 Berlin
1. Etage Vorderhaus / Nihoma 1 mala pés
Tram: 2/3/4 - wéstige = Haltestelle „Am Friedrichshain“
Biro rojén péncsem saat 19:00 - 20:00
Telefon: (rojén péncsem saat 19:00 - 20:00) 030 / 41935839
mobil: 01603410547
E-Mail: konsumfuerfreiesfluten@yahoo.com
Rupelé internét: <http://www.chipkartenini.squat.net>



bureau - neu:

Dienstag, Tuesday,
Mardi 19-20

Peneberén héja, mirovén xudanén çipkartan yan gutşayinan!

Wexté ku hun wi menşuri vedixwinin, eger we li dayira sosiyalé çipkart yan gutşayin standibin, dikarin werne cem me, em dé bexebitín ku wan kartan ji we ra bi parén kaş vebigohrin.

Me biroyek heye li „Haus der Demokratie“ û hemi rojén péncsem saat 19 - 20 vekiriye.

Vegohrina kartan dé wesa bit:
eger hun hatin cem me, em dé bihevra çay vexoyin û wé meselé ji we ra hedi şirove bikin.

- Eger we çipkart standin, yekser pişti sozé xwe li dayira sosiyali roja péncsem werne cem me, hés ku wextén wan kartan zor maye. Hun dibe kartén xwe ji bo 2 yan 3 heftan cem mebihelin. Em gelek mirovan nasdikin, ku wi yasay rasist hiséb diken û parén kaş hene. Em dé kartén we bideyin wan, ew ji bi wan kartan tiştan dékirin. Wexté ku we pişti hingi dizivirne cem me, em dé kartén we u parén kaş bideyin we. Em çipkartan 1:1(yek bi yek) vedgohrin u eve çend wexte em wi kari dikeyin û heta niha ev kare bi drusti bi réwe çuye. Em nikarin sozé bideyin we ku hemi kartén we vegohrin, eve dimine ser wí hindé ku çend kes bi wan çipkartan tiştan dikirin, lé em hiç teqsiriyé nakeyin.
- Eger we „gutşayin“ (kartén bedel pare) hene, mesele asantir dibe, rojén péncsemiya werne cem me û em dé wan gutşayinan ji we ra 1:1 (yek bi yek) bikirin. Bi wí çaxi hun parén kaş ji me ra bistinin, lé em wasa ji nikarin sozé bideyin we ku hemi gutşayinan ji we ra bikirin.

Taku vegohrina çipkart u gutşayinan ne tené ji cem me gé bibe, em dé hindek hawkaran li gel we aşna bikeyin, ku pişti hingi dé berdewam çipkart u gutşayinén we bihéne vegohrin. Ew yan bi we ra diçine tişt kiriné yan ji bixwe kartén we dikirin. Wesa ne şerte ku vegohrina çipkart û gutşayinan bes li cem me gé bibe. Eger hun kesén din nasdikin, ku wan ji çipkart yan gutşayin hene, békne wana ku ew ji béne cem me, yan menşuran ji bo wan ji me bixazin, me menşur bi gelek zimanan hene û hun dikarin wana pitir (kopî) biken.

Em xwe weki rékxistineka arikariyén mirovi nizanin, belki em initiativeka siyasine. Ruyeki karé me vegohrina kart û şayinane u riwé din eksiyonén siyasine , ji bo rakirina yasayén rasi stiyén biyaniyan li Elmanya. Taku em bikarın bi régeka siyasi wi sistemé kartan rabikin, ji bili eksiyonén zanyariyan em eksiyonén kiriné ji gé dikeyin. Ji bo wan aksyonan em herdem bangi we dikeyin. Li wir em çipkart û gutşayinan vedgohrin û ligel mirovén din jí dipeyvíñ, ku ew jí pişkdariyé di wan aksyonan biken. Mesela heri giring ji bo me di wan aksyonan da ruwé siyasiyé wane. Em dibe mesela çipkart û gutşayinan protésto bikeyin.

Heta carek din bi xatira we, initiativa we li diji çipkart u gutşayinan